


**P E N
N O R W A Y**

Mafên Zimanî Yên Kurdan Di Dadgehan De Li Tirkîyeyê

**Raporek anketbingeh ji bo diyarkirina standarda
peyrewa pêşkêşkirina xizmetên wergera
Kurdî-Tirkî di dadgehên Tirkîyeyê de û
nirxandina ezmûna tawanbarên ku xwastine
delîlan, îfadeyan û parastinê bi zimanê xwe
pêşkêş bikin.**

2025



©PENa Norwecê, Kanûna Pêşîn 2025

Ev rapor ji aliyê PENa Norwecê ve hatiye amadekirin.

Amadekar: Caroline Stockford, PENa Norwecê, Şêwirmenda Tirkîyeyê

Derbarê PENa Norwecê da

PENa Norwecê rêxistineke serbixwe ye ku ji bo parastin û pêşvebirina azadiya derbirînê haiye avakirin û piştgiriya nivîskar, rojnamevan û wan kesan dike ku azadiya wan ya derbirînê di xetereyê de ye, yan jî di zindanê da ne. Armanca PENa Norwecê ew e ku mafê her kesî hebe xwe bi awayekî azad îfade bike.

PENa Norwecê beşek ji PENa Navneteweyî -mezintirîn rêxistina nivîskaran û azadiya derbirînê ya cîhanê- ye ku di sala 1921ê de hatiye damezrandin.

têkilî:

pen@norskpen.no

Sentralen, Øvre Slottsgate 3, 0157 Oslo, Norwec

www.norskpen.no Facebook: /NorskPEN Instagram: /norskpen

Têbînî: Ev rapor bi awayekî onlayn û bi her sê zimanên Îngilîzî, Tirkî û Kurdî li ser rûpela PEN Norwecê berdest e.

**P E N
N O R W A Y**

Mafên Zimanî Yên Kurdan Di Dadgehan De Li Tirkiyeyê

**Raporek anketbingeh ji bo diyarkirina standarda
peyrewa pêşkêşkirina xizmetên wergera
Kurdî-Tirkî di dadgehên Tirkiyeyê de û
nirxandina ezmûna tawanbarên ku xwastine
delîlan, îfadeyan û parastinê bi zimanê xwe
pêşkêş bikin.**

2025

Naverok:

Pêşgotin	6
Dîroka Rêzikên Têkildarî Bikaranîna Zimanê Kurdî li Tirkîyeyê.....	9
Rêzikên Qanûnî Yên Heyî Yên Têkildarî Mafê Gihiştina Wergêran yê Bertawanan Di Dozan de Li Tirkîyeyê.....	12
Anketa 225 bertawanên ku xwastine di pêvajoyên dadgêriyê da zimanê Kurdî bi kar bînin	18
Hevpeyvînên bi wergêran ra.....	32
Hevpeyvînên bi parêzeran ra.....	35
Encam û Pêşnîyaz.....	38
Tabloya bersivên anketê.....	41
Manîfestoya Girona'yê ya PEN'ê.....	42

Pêşgotin

PENa Norwecê bi dehan salan rewşa mafên mirovan li Tirkîyeyê şopandîye. Bi taybetî ji sala 2018ê û vir ve, me darizandinên rojnameger û aktorên civaka sîvîl ji nêz ve şopandîne. Me bi awayekî kesane çavdêriya gelek ji wan dozan kiriye û me di derbarê her dozekê de rapora rûniştinan amade kiriye. Ev çavdêriya tekûz ya li ser hevîgirtin û hevnegirtina pergala dadgêriya Tirkîyeyê li gel qanûna rêkarên darizandinê, peymanname û çarteyên ku wî welatî îmza kirine, bûye sedema projeyên zêdetir yên mîna Projeya Angaştnameyê ya Tirkîyeyê, ku tê de, heta roja îro 30 angaştname hatine lêkolînkirin da ku hevîgirtina wan angaştnameyan li gel standardên navxweyî û navneteweyî bê nîrxandin.

Encameke din a şopandîna darizandinan ji aliyê me ve ew bûye ku, me şahidiya serederiya li gel bertawanên Kurd kiriye, nemaze di wan dozan de ku tawanên têkildarî propagandaya terorê, alîkarî û endamtiya rêxistineke çekdar li ser bertawanan dihatin barkirin. Me dît ku tevî nebûna rîska fîrarê yan jî destkarîkirina delîlan, desteserkirinên pêşdadgehî bi awayekî berfireh pêk tên. Me dît ku angaştname ji ber bicîhkirina belavokên ku wesfa rêxistinê û dîroka komên çekdar li xwe digirin, gelek dirêj dibin. Herwiha di heyama pêvajoya dadgêriyê de, ji destpêka binçavkirinê heya girtina fermî ya bertawanan û di heyama hemû darizandinan de jî, mafên zimanî yên wan bertawanan têne redkirin. Ji bilî vê jî, ji aliyê endamên hêza dadgêriyê ve, bi awayekî rasterast heqaretê li ziman û çanda bertawanan tê kirin.

Di dema dadgehkirina rojnamevanê Kurd Nedim Türfent de, ku ji aliyê çend navendên PENê ve ji nêzîk ve dihat şopandin, me bihîst ku daxwaza wî ya bikaranîna zimanê Kurdî di piraniya rûniştinan de hatiye redkirin. Dema ku daxwaza wî ya gihiştina wergêrê hatiye qebûlîkirin jî, wergêr di karê xwe de jêhatî nebûye û li dewsa ku gotinên bertawanî bi awayekî peyv bi peyv wergerîne, hevokên amade dubare kirine. Ew yek bû sedem ku em bi awayekî tekûztir li ser peyrewa têkildarî pêşkêşkirina xizmetên wergerê li dadgehên Tirkîyê lêkolîn bikin.

Qanûna hakim li ser wergerandinê di hemû astên pergala dadgêriyê de ew e ku dadgehên herêmî li şûna ku di listeyên wergêran de kesên ku beşdarî ezmûnên hikûmî an sebixwe bûne an her awayê belgenamêyên profesyonel nîşan dane bicih bikin, cih didin wan kesan ku di noteran de li ser şêyandariya xwe sond xwarine û bi wî awayî jî wan listan diweşînin. Bi haydarbûn ji vê rastîyê, me biryar de ku anketekê li gel hejmareke zêde ya kurdan çêkin, ku li Tirkîyeyê di dozeke hiqûqî de, di astên cuda yên dozên medenî yan dozên Dadgeha Sizayî ya Bilind de hatine darizandin. Armanca me ew bû ku di derbarê ezmûna wan de ji wan pirsan bikin. Me xwast ku em bizanin gelo wan kariye hûrgiliyên dozê fam bikin an na, gelo ji bo wan mafê gihiştina wergêr hatiye dabînkirin û wergêran heta çi astekê karê xwe baş pêk aniye. Herwiha me ji wan pirsî dema ku wan di dadgehê de daxwaza parastina bi zimanê Kurdî kir, hesta wan çi bû.

Yek ji armancên sereke yên navendên PENê li çar aliyê cîhanê, û herwiha armanca sereke ya PENa Navneteweyî çavdêriya mafên zimanî ye li seranserî cîhanê. PEN ne tenê piştgiriya dide nivîskarên di xetereyê de, nivîskarên di zindanan de, nivîskarên jin û nivîskarên ji bo aştîyê û ji wan ra kampanyayan çêdike, herwiha piştgiriya dide pêşxistina wergerandin û mafên zimanî li seranserê cîhanê. Komîteya Werger û Mafên Zimanî ya PENa Navneteweyî di navendên PENê yên her çar aliyên cîhanê de xwedî komîteyên endam e. Wê komîteyê di salên dawî de piştgirî daye konferansekê li ser zimanên Afrîqayê ku li Johannesburg (2016)¹ hate lidarxistin. Herwiha zimanên xwecihî yên Amerîkaya Başûr, di Civîna Komîteya Werger û Mafên Ziman de li Chiapasa Meksîkayê (2019)² û zimanên xwecihî yên Fîlîpîniyan³ û gelên Samî yên bakurê Fînlândayê (2024)⁴ li gor Manifestoya Gironayê hatine lêkolîn kirin.

Mafên zimanî di çarçoveya gelek mekanîzmayên cuda yên têkildarî mijarên dadgêriyê de têne parastin. Yek ji wan mekanîzmaya xala 6.3yê ya Peymannameya Ewropî ya Mafên Mirovan e ku mafê darizandina dadmend, mafê rawekirina darizandinan ji bo bertawanî bi zimanekî ku fam dike û mafê dadgehkirina biwext li xwe digire. Cihê amajeyê ye ku hîn li Tirkîyeyê hemû kes ne xwende ne û gelek Kurd û nemaze jin hene ku zimanê Tirkî nizanin û nikarin bi wî zimanî bi axivîn.⁵

Li gor xala 5.2ê: “Her kesê ku tê girtin, divê demildest bi zimanekî ku jê fam dike, ji sedemên girtina xwe û hemû tometên arastekirî bê agahdarkirin.”

Lê belê di tu rêzikên Qanûna Bingehîn a Tirkîyeyê de rê nayê dayîn ku welatî di qadên hiqûqî, perwerdehî û şaredariyan de bi zimanê xwe yê dayikê bi axivîn. Tevî ku sedî 20ê nifûsa Tirkîyeyê xwedî nasnameya Kurdî⁶ ne, Kurdî wekî zimanekî biyanî tê dîtin û li Tirkîyeyê wekî zimanê fermî nayê qebûl kirin. Wekî din, tu formek standardkirî ya ezmûnên şêyandariya zimanî yên wergêran, bernamêyên perwerdehiyê yên seranserî an jî pilekirin an standardkirina wergerkirina ji Tirkî bo Kurdî an jî ji Tirkî bo zimanên biyanî yên din nayê dîtin.

Ji bo nixandina rewşa bertawanên ku xwastine di dadgehê de bi zimanê Kurdî bi axivîn, parêzerên wan û wergêrên ku ji bo hêskankirina hevtêgihiştinê li Tirkîyeyê di navendên polîsan û

dadgehan de dixebitin, me ew rapor berhev kiriye. Me di raporê de bi 225 bertawan û girtiyên Kurd, parêzerên wan û wergêran re anket çêkiriye û me rêzikên qanûnî yên heyî yên têkildarî wergerê jî di raporê de pêşkêş kiriye.

Methodolojiya ku me di pêkanîna wê anketê de esas girtiye ji xalên jêrîn pêk tê:

a) Amadekirina anketekê ku daneyên îstatîstîkî û vegotinî di nav xwe de bihewîne, bi mebesta ku hem hejmarên têkildar bînin famkirin û hem jî bandora ku pêşdarazê li ser Kurdîyê kirîye û herwiha bandora ku înkarkirina mafê gihiştina wergêrî li ser tawanbaran kirîye, bînin famkirin.

b) Du parêzeran, yek Tirk û yek jî Kurd, anket birine girtîgehê û ji bo tijîkirina anketê jî bi telefonê bi bertawanên berê re hevdişîna pêk anîn. Nasnameya beşdarên anketê ji aliyê PENa Norwecê ve veşartî hatine hiştin.

c) Çêkirina têkiliyan bi rêya pirsnameyê, bi wergêr û parêzerên ku bi xwesipêrên kurd re dixebitin.

d) Bidestxistina û pêşkêşkirina paşxaneyê dîrokî ya cudakariya zimanî ya ku li dijî Kurdîyê pêk tê.

e) Berawirdkirina nebûna rêzikên qanûnî yên têkildarî wergêrên jêhatî li Tirkîyeyê li gel Brîtanîyayê, cihê ku Enstîtuya Pispors a Zimannasan (CIOL) Dîplomaya Wergeriya Xizmetên Giştî pêşkêş dike, da ku bi wî awayî avakirina enstîtûyekî serbixwe ya mîna CIOLê li Tirkîyeyê bê pêşniyazkirin.

f) Pêşniyazên xwe bi berçavgirtina vê rastîyê ku guhertinên mezin dê wextê bigirin, pêşkêş bikin.

Em hêvî dikin ku lêkolîna me ya bêalî û zanistî di warê avakirina standardên naskirî yên têkildarî şêyandariya wergêran ji bo hemû cotên zimanî yên ku li Tirkîyeyê bi wan kar tê kirin bi sîd be. Herwiha em hêvîdar in pêşniyazên me ji bo parastina zêdetir ya mafên tawanbaran ku parastina xwe bi zimanê xwe pêşkêş dikin bînin cîbicîkirin, wergêrên perwerdekirî, jêhatî û serbixwe bînin peywardarkirin û bertawan ji hemî hûrgiliyên doza xwe û hemû rîskên binçavkirinê bînin agahdarkirin. Hêviya me ew e ku di wî warê de, ziman û siyaseta ji hev bînin veqetandin û ji bo ziman û zaravayên Kurdî û kesên ku wan wekî zimanê yekem bi kar tînin, rêz û hurmeta ku heqê wan e, bînin alîgirî û pêşdarazê bînin dayîn.

PENa Norwecê dê bi vê rapora li ser Tirkîyeyê di sala 2025an de, li Neteweyên Yekbûyî (li pey nêrîna me û PENa Navneteweyî ya ji bo Lêkolîna Periyodîk a Gerdûnî ya ji bo Tirkîyeyê ya li ser mijara Mafên Zimanî yên Kurdan) û Konseya Ewropayê parêzvaniya zimanê Kurdî bike û em dê berfirehkirina projeyê bi rêya civînên perwerdehiya ceribandî û şêwirmendiyê bidomînin.

Caroline Stockford
Şêwirmenda Tirkîyeyê
PENa Norwecê

Notên Dawî:

- 1 <https://www.pen100archive.org/tlrc-meeting-in-johannesburg/>
- 2 <https://www.pen-international.org/news/kl7hgawijz03vvftq8iehuw60olukn>
- 3 <https://www.pen100archive.org/panel-discussion-at-manila-congress/>
- 4 <https://www.suomenpen.fi/en/pen-tlrc-lausun-to-saamen-kielista-ja-kirjallisuudesta/>
- 5 Neşe Düzel, "Pazartesi Konuşmaları" ("Monday Chats"), Yeni Yüzyıl (İstanbul), İnternet baskısı, 27 Nisan 1997: İnsan Hakları İzleme Örgütü'nün 1999 yılı Türkiye raporundan: "Türkiye'nin güneydoğusundan sorumlu devlet bakanı Dr. Salih Yıldırım, bölgede yaşayanların üçte birinin Türkçe bilmediğini, bu oranın kadınlar arasında yüzde 50'ye çıktığını belirtti." (www.hrw.org/reports/1999/turkey).
- 6 <https://yetkinreport.com/2024/11/18/turkiyede-ne-kadar-kurt-yasiyor-acilima-ne-diyorlar/>

Dîroka Rêzikên Têkildarî Bikaranîna Zimanê Kurdî li Tirkîyeyê

Pêşnîne:

Du paragrafên dawî yên xala 39ê ya Peymana Lozanê (peymana aştiyê ku di 24ê Tîrmeha sala 1923yê de wekî encamnameya dawî ya konferanseke dirêj ya heft mehî ji bo diyarkirina sînorên Tirkîyeya modern hate dariştin û dawî bi Şerê Cîhanê yê Duyem anî) dibêje ku:

“Têkildarî bikaranîna zimanan, nabe tu astengî li ser têkiliyên kesane û bazirganî û warên din yên mîna ragihandin, cureyên weşanê û herwiha warê civînên giştî ji bo şarmendên Tirkîyeyê bêne çêkirin.” Digel ku hebûna zimanekî fermî nayê redkirin, divê ji bo şarmendên Tirkîyeyê yên ku ji bilî zimanê Tirkî bi zimanên din diaxivin, îmkana bikaranîna devkî ya zimanên wan li pêşberî dadgehê hebe.”¹

Lê belê cudakariya ku armanca wê kêmkirin an jî tune kirina zimanê kurdî bûye, di salên 1920î de û bi avabûna Komara Tirkîyeyê ya nû dest pê kiriye. Li wî welatî, bicihkirina zimanê Tirkî wekî zimanê navincî li dewsa zimanê kurdî, bibandortirîn amûr hatiye dîtin ji bo homojenkirinê. Ji salên 1960î heya roja îro, li pey çend derbeyên leşkerî, siyaseta derxistina zimanê Kurdî ji jiyana giştî hatiye bingehgirtin û ew siyaseta bûye sedema turkîkirina navên gundan û bajaran, qedexekirina weşandina kovar û belavokên edebî yên Kurdî, qedexekirina navên netirkî ji bo zarokên nûbûyî² û di dawiyê de jî, qedexekirina reha ya ravekirin, weşandin û belavkirina fikir û ramanan bi zimanên din yên ji bilî Tirkî.³ “Qanûna Weşanên Bi Zimanên Ji bilî Tirkî” sê sal piştî derbeya leşkerî ya sala 1980yê, di Çiriya Pêşîn ya sala 1983yê de hat pejirandin. Di xala duyem ya wê qanûna tirsna de, wiha hatibû gotin: “Derbirîn, belavkirin û weşandina ramanan bi her zimanekî qedexe ye, ji bilî zimanên fermî yên yekem yên dewletên ku ji aliyê dewleta Tirkîyeyê ve hatine naskirin.” Wê qanûnê bi zelalî amaje bi wê çendê kiribû ku zimanê fermî yê şarmendên Tirkîyeyê zimanê Tirkî ye û pêşxistina zimanekî din ji bilî zimanê Tirkî, tawaneke sîzayî ye ku sîzaya wê zindan e. Deh sal kêşê heta ku di 25 Kanûna Paşîn a sala 1991ê da qanûneke din cihê wê girt⁴

Di sala 1992yê de, Serokwezîr Turgut Özalî wê hewla berdewam ya Komarê ji bo homojenkirina çandî, ku ji dema avakirina Komarê di sala 1923yê hatibû esasgirtin rexne dike û amajeyê

bi bandora nerênî ya wê hewildanê li ser pêkhatiya pirçandî ya Anatoliyayê⁵ dike.

Bi heman awayî, di sala 1992yê de, di Rapora Kurdî ya Partiya Refah de hatibû ragihandin ku ji ber piraniya Kurdan ne li pey perçekirina welatî ne, bikaranîna mafên zimanî û çandî ji aliyê wan ve rê li ber gefa cudakariyê venake.

Di sala 2005ê de, Serokwezîr Erdoğanî soz da ku dê astengiyên li pêşiya axaftin û nivîsandina bi zimanê Kurdî⁶ û zaravayên wê ji holê rake. Di sala 2007 de, AKP'ê Înîsiyatîfa Demokratîk (Demokratik Açılım) da destpêkirin ku di çarçoveya wê de Vekirina Kurdî (Kürt Açılımı) (di nav destpêşxeriyên din yên ji bo zimanên piçûktir, yekem de) hat destpêkirin. Wê destpêşxeriyê rê li ber reformên zêdetir⁷ vekir û bû sedem ku qedexeya bikaranîna zimanê kurdî di medyayê de bê rakirin.

Di Tebaxa sala 2002yê⁸ de, bi awayekî fermî dest bi kursên zimanê Kurdî hat kirin. Di wê çarçoveyê de kursên taybet yê perwerdeyê ji bo zimanê kurdî û ziman û zaravayên din yê Anatoliyayê dikarin bîn vekirin (xala 11ê). Di berdewamiyê de Desteya Perwerdeya Bilind (Yüksek Öğretim Kurulu) jî, bi derstûrnameyekê rê da ku kursên taybet û giştî yê zanîngehan ji bo perwerdeya ziman û zaravayên Kurdî bîn vekirin.⁹

Di 21ê Kanûna Paşîn ya sala 2011ê de, Desteya Perwerdeya Bilind (YÖK) avakirina departmanên ziman û edebiyata Kurdî pejirand. Ew biryar bû bingeha vekirina wan departmanan di zanîngehên Artuklu ya Mêrdînê, Alparslan a Mûşê û Zanîngeha Bîngolê de û herwiha bû bingeha vekirina departmanên perwerdeya ziman û edebiyata Zazakî li zanîngehên Bîngol û Tunceliyê (Dêrsim). Ji dema avakirina wan departmanan heya roja îro, her sal nêzî 100 xwendekar ji wan zanîngehan mezûn bûne.

Di sala 2022yê de û di demekê de ku li seranserî Tirkiyeyê 20.000 mamoste hatine damezrandin, tenê sê ji wan mamosteyên zimanê Kurdî bûne ku du ji wan mamosteyên Kurmancî û yek jî mamosteyê Kirmanckî/Dimilî bûye. Li welatekî ku zêdetir ji 20 milyon kurdan dijîn, bi hezaran mamosteyên zimanê kurdî li benda damezrandinê ne.

Lê belê di rewşa awarte ya piştî hewildana derbeyê ya sala 2016ê de kursên kurdî, dibistan û beşên Kurdî yê zanîngehan cardin hatin girtin. Gelek biryarên awarte li şûna dezgeh û rêxistinên Gulênistan ku tê gotin handerên derbeyê bûne, dezgeh û rêxistinên kurdan kirine armanc. Ew kiryar jî ji aliyê gelek kesan ve wekî lêbekê ji bo sepandina astengiyên zêdetir li ser çanda kurdan hate şîrovekirin.¹⁰

Tirkiye û Peymana Zimanên Herêmî yan Kêmîneyan

Ji ber vê rastiye ku kiryar û siyaseta hikûmetên li dû hev yê Tirkiyeyê bûye sedema tunekirina zimanê Kurdî, bi awayekî ku niha xelk ji her demê kêmtir wî zimanî¹¹ wekî zimanê yekem yê hertimî bikar tîne, tê pêşniyazkirin ku Tirkiye Peymana Zimanên Herêmî yan Kêmaran îmza bike.

Îmzakerên Peymana Ewropî ya Zimanên¹² Herêmî yan Kêmîneyan li ser vê soza peymanê tekeziyê dikin ku dibêje: *"mafê bikaranîna zimanekî herêmî yan kêmîneyan di warên jiyana taybet û giştî de, li gor binemayên Peymannameya Navneteweyî ya Mafên Medenî û Siyasî û li gor ruhê Peymannameya Konseya Ewropayê ya ji bo Parastina Mafên Mirovan û Azadiyên Bingehîn, mafekî nedewrbar e"*. Xala 7.1.(d)yê destnîşan dike ku îmzeker dê misoger bike ku rê li ber *"hêsankarî û/an teşwîqkirina bikaranîna zimanên herêmî an kêmîneyan di axaftin û nivîsandinê de, di jiyana giştî û taybet da"* xweş bibe. Herwiha li gor xala 7.1. (e)yê *"di wan qadan de ku di vê peymanê de amajê pê hatiye kirin, parastin û pêşxistina têkiliyan di navbera komên ku zimanekî herêmî yan ji kêmîne bikar tînin û komên din yê di welatî de ku zimanekî nêz an wekhev bikar tînin, û herwiha çêkirina têkiliyên çandî li gel komên din yê welatê ku zimanên cuda bikar tînin"*. Herwiha Xala 7.1.(f)yê jî *"dabînkirina şikl û amûrên guncav ji bo perwerdekirin û xwandina zimanên herêmî yan kêmîne di hemû astên guncav da"* mîsoger dike.

Ji bo pêşgirtina ji cudakariya li hember zimanên ku di welatekî diyarkirî de kêmîtir tîne bikaranîn, Peyman vê çendê tîne ziman ku (xala 7.2.yê) *"aliyên peymanê soz didin ku heger hîn wisa nekiribin, her awayê cudakarî, bêparkirin, sîlordarkirin an tercîhên nedadmend yê têkildarî bikaranîna zimanekî herêmî yan kêmîneyan ji holê rakin ku armanca wan ew e ku pêşiya parastin û pêşxistina zimanekî bigirin an wî zimanî bixine xetereyê. Armanca berçavgirtina tevdirên taybet yê di berjewendiya zimanên herêmî yan kêmîneyan de bilindkirina asta wekheviya di navbera bikarînerên wan zimanan de û nifûsa din ya welatî ye ku ji ber rewşa wan ya taybet pêk tê û wekî cudakariya li dijî bikarînerên zimanên din yê berbelavtir nayê hesibandin. Dema ku mafên bingehîn yê wekî mafên hînbûn, weşandin û rahênana zimanî hate garantîkirin, ew bixwe pêşkeftineke xwezayî ye."*

Di warê peyketina qanûnî de, Peyman ne tenê mafê parastina bi zimanê xwe, herwiha mafên mîna yê ku di Peymannameya Ewropî ya Mafên Mirovan (xala 9ê) (1,i,ii) de jî cih digirin jî li xwe digire. Herwiha di çarçoveya xala 9.1.iii'ê de, pêngavekî zêdetir radike û dibêje ku: *"delîl nivîskî be an devkî, nabe tenê ji ber ku bi zimanê herêmî yan ji kêmîneyan hatine dariştin, neqebûlbar bînin dîtin; û/an (iv) heger ku bê xwastin, divê belgenameyên têkildarî peyketina qanûnî, bi alîkariya wergêran û bêtî standina lêçûnên zêdetir, bi zimanên têkildar yê herêmî an kêmîneyan werin amadekirin."*

Tê pêşniyazkirin ku rayedarên Tirkîyeyê, bi berçavgirtina çaksaziyên têkildarî dabînkirina xizmetên wergerandina zimanên biyanî di dadgehên wî welatî de (di nav de zimanê xwecihî yê kurdî jî), îmzakerîna Peymanê wekî nîşaneyê berbariya li hember parastina zimanên kêmîne yan biçûktir li Tirkîyeyê bibînin.

Notên Dawî:

- 1 https://www.mfa.gov.tr/lausanne-peace-treaty-part-i_-political-clauses.en.mfa
- 2 Moustakis and Chaudhuri, 2005; Yeğen, 2009
- 3 Hughes and Karakaş, 2009; Yeğen, 2009
- 4 kanundmc06602932.pdf
- 5 Candar, 2013; Robins, 1993; Yucel, 2016
- 6 Mitchell, 2012
- 7 Article 9 of the Statute of Turkey (SoT) 4709/2001
- 8 SoT 4771/2002,
- 9 JEMIE Vol 15, No 3, 2016
- 10 Engaging minorities under emergency: Turkish modular emergency and the Kurdish case revisited <https://www.tandfonline.com/doi/full/10.1080/14683857.2023.2170725>
- 11 <https://www.rudaw.net/english/middleeast/turkey/15052024>
- 12 Signatory countries being: Armenia, Austria, Bosnia & Herzegovina, Croatia, Cyprus, Czechia, Denmark, Finland, Germany, Hungary, Liechtenstein, Luxembourg, Montenegro, Netherlands, Norway, Poland, Romania, Serbia, Slovak Republic, Slovenia, Spain, Sweden, Switzerland, Ukraine and the United Kingdom

Rêzikên Qanûnî Yên Heyî Yên Têkildarî Mafê Gihiştina Wergêran yê Bertawanan Di Dozan de Li Tirkîyeyê

Di dema niha de, li Tirkîyeyê tu standardkirinek têkildarî dabînkirina xizmetên hînkariyê an perwerdeyê ji bo wergêran tune ye. Kesên ku bixwazin di dadgehan de wekî wergêr bixebitin, tenê pêwîst e li noteran amade bin û şêyandariya xwe ya di warê wergerê de binin ziman û bi muhira noterê ragihînin. Di vê çarçoveyê de ji bilî hebûna dîplomaya xwandina lîseyê tu mercêk pêwîst nake.

Di vê beşê de, rêzikên têkildarî birêkûpêkkirina lîsteyên wergeran cih digre ku 5ê Adara sala 2013ê di Rojnameya Fermî de hatiye weşandin. Herwiha di vê beşê de amajê bi xala 202yê ya Qanûna Rêkarên Darizandina Sizayî ya Tirkîyeyê hatiye kirin ku mijara pêşkêşkirina wergêran li xwe digire.

5 adara 2013 Sêşem	Rojnameya Fermî	Hejmar: 28578
--------------------	-----------------	---------------

PEYREW

Ji aliyê Wezareta Dadê ve:

**QANÛNÊ HAKIM LI SER BIRÊKÛPÊKKIRINA LÎSTEYÊN WERGÊRAN
LI SER BINGEHA QANÛNA RÊKARÊN DARIZANDINA SIZAYÎ**

BEŞA YEKEM

Armanc, Qad, Bingeh û Pênase

Armanc û Qad

Xala 1 – (1) Armanca vê peyrewê birêkûpêkkirina binema û prosedurên têkildarî lîsteyên wergêran e ku bi armanca dabînkirina wergera Tirkî tê amadekirin,

a) Beyanên têkildarî angaşt an parastinê yê qurbanî, şahid, gumanbar û bertawanên ku nikarin bi Tirkî bi axivîn yan jî astengdar in, di dema vekolînan de an jî di qonaxa darizandinê de,

b) Parastina devkî ya bertawanî ku dê di qonaxa darizandinê de were bihîstin, piştî arastekirina angaştnameyê û li ser bingeha gewhera dozê, dê bi zimanekî pêk bê ku ew radigihînin dikarin xwe bi wî zimanî bi awayekî baştir îfade bikin.

c) Ev peyrew mijara amadekirin û birojkirina lîsteyên wergêran ji aliyê komîsyonên dadgêrî yê parêzgehan yê dadgehên destpêkî ve û herwiha diyaskirina zimanên ku mirov dikarin ji bo wan wekî pisporên wergerê serlêdanê bikin, mercên pêwîst yê wergêriyê, metodên serlêdanê, prosedur û binemayên nixandina wan, bicihkirin û derxistina wan ji lîsteyê û binemayên ku divê ji aliyê wergêran ve bêne bingehgirtin, li xwe digire.

Bingeh

Xala 2 – (1) ew peyrew li gor xala 202yê ya Qanûna Rêkarên Darizandina Sizayî ya hejmar 5271'ê ya 12/4/2004'ê hatiye amadekirin.

Pênase û kurtebêje

Xala 3 – (1) Di vê peyrewê de, bêjeyên jêrîn xwedî wateyên jêrîn in;

a) Wezaret: Wezareta Dadê,

b) zimanê îşaretan: ew zimanê dîtbar e ku ji bikaranîna tevgerên dest û laşî û îfadeyên rû ji bo derbirîna hest, hîzr, hêvî û pêdiviyên pêk tê.

c) Qanûn: Qanûna Rêkarên Darizandina Sizayî ya 4/12/2004ê ya hejmar 5271ê,

d) Komîsyon: Komîsyona Dadgêriyê ya Parêzgehê ya Dadgeha Destpêkî

e) Lîste: Lîsteya wergêran ku bi awayekî salane ji aliyê Komîsyona Dadgêriyê ya Parêzgehê ya Dadgeha Destpêkî ve tê amadekirin.

f) Wergêr: ew kesê heqîqî ye gotinên qurbanî, gumanbar û şahidan ji zimanên din bo Tirkî werdigerîne an jî di maweya qonaxa vekolîn û darizandinê de zimanê îşaretê bikar tîne.

g) UYAP: Pergala Înformatîk ya Dadgêriya Neteweyî

h) Sal: Sala salnameyî.

BEŞA DUYEM

Rêzikên Giştî

Diyarkirina hewcedariya wergêrî

Xala 4ê- (1) Her sal divê herî dawî heya 15ê meha Îlonê, Komîsyon ji serdozgeriyên giştî yê parêzgeh, herêm û dadgehên sizayî yê di bin desthilata xwe de bixwazin ku heya 30yê Îlonê agahiyên têkildarî zimanên asayî û zimanê îşaretan ku pêdiviya wan bi wergêran heye dabîn bikin.

(2) Komîsyon dê li ser bingeha agahî û serlêdanên ku pêk hatine, diyar bikin ku ji bo kîjan zimanên asayî û zimanê îşaretan pêdivî bi wergêran heye.

ragihannameya giştî

Xala 5 (1) - Komîsyon divê heya 15ê Çiriya Pêşîyn ragihannameyên giştî derxin û kesên ku dixwazin xizmeta wergêriyê pêk bînin vexwînin ku daxwaznameyên xwe yê serlêdanê radestî serokatiya Komîsyonê bikin. Divê komîsyon di vê derbarê de ji sazî û rêxistinên giştî yê têkildar re ku di asta parêzgeh û herêman de dixebitin, û herwiha ji rêxistinên pisporî re, an ku rêxistinên ku xwedî statûya saziyeke giştî ne, nameyên fermî bişîne.

(2) ragihannameya giştî divê di formeka nivîskî de bêne çapkirin û di salonên komîsyonên dadgêriyê yê dadgehên destpêkê yê parêzgehan de û herwiha di dadgehên her desthilareke dadgêriyê de bêne daliqandin û herwiha di rojnameyên herêmî û medyayên elektronîkî de bêne weşandin. Di rewşên pêwîst de, pêkan e ku sûd ji amûrên adetî yê ragihandinê jî bê wergirtin.

(3) Herwisa divê di ragihannameyên giştî de amaje bi wê dîrok yan dîrokan bê kirin ku pêwîst e kesên ku li lîsteyan tên zêdekirin, ji bo sondxwarinê amade bin.

Mercên ketina nav lîsteyê da

Xala 6 - (1) ji bo ku kesek wekî wergêr di lîsteyê de cih bigire,

- a) Divê şarmendê Komara Tirkîyê be,
- b) Divê di dema serlêdanê de xwedî têrbariya dadî be,
- c) Divê herî kêr derçûyê dibistana seretayî be.
- d) Divê di dema serlêdanê de temenê wî/wê zêdetir ji 18 salan be.
- e) Nabe ku ew kes ji ber pêkanîna tawanên li dijî dewletê û dadgehan, tawanên ku di Qanûna Antîterorê ya hejmar 3713ê ya 12ê nîsana 1991ê de amaje bi wan hatîye kirin, tawanên têkildarî vedizînin biçûk û mezin, şantaj, bertildan, şelandin, dekbazî, sextekarî, şikandina baweriyê, mayepûçiya bidekbazî, qaçaxkarî, bikaranîna dek û dolaban di mezad an bazirganiyê de hatibin sizadan. Heger ku siza hatibe efûkirin yan jî taloqkirin an dadgehê biryara taloqkirina biryara dawî dawî dabe, dîsa jî ew kes ne xwedî mercên serlêdanê ye.
- f) Nabe ji ber pirsgerêkên dîsîplînê ji xizmetên sîvîl hatibe derxistin, yan jî ji pîşeya xwe hatibe dûrxistin, yan jî ji pêkanîna her awayê pîşeyan hatibe qedexekirin.
- g) Divê nişetecih wê parêzgehê be ku Komîsyon lê ye, yan jî çalakiyeke profesyonel di wê parêzgehê de pêk bîne.
- h) Nabe ku di listeya komîsyonên din de cih girtibe.

Pêvajoya Serlêdanê

Xala 7 - (1) Her sal kesên ku dixwazin navên wan wekî wergêr li listeyê bîn zêdekirin, divê bi awayekî kesane bi rêya nameya serlêdanê heya 31ê Çiriya Pêşîn, serlêdana Komîsyonê an ofîsa dozgeriya giştî ya herêmê bikin, ku ew serlêdan jî dê ji bo komîsyonê bîne şandin. Dê belgeyên ku arasteyî ofîsa dozgeriya giştî ya herêmê hatine kirin, bi rêya Pergala Înformatîk ya Dadgêriya Neteweyî (UYAP) ji bo komîsyona têkildar bîne şandin. Belgeyên orjînal an kopiyên wan yên ku ji aliyê ofîsa dozgeriya giştî ya herêmê ve hatine tesdîqkirin, divê radestî komîsyona têkildar bîn kirin. Daxwaznameyên ku piştî dîroka diyarkirî tîn şandin, nayên hesibandin.

(2) Herwiha divê nameya serlêdanê agahiyên têkildarî hesaba bankî jî li xwe bigire.

Divê belge ji bo piştgiriya nameya serlêdanê bîn arastekirin.

Xala 8 – (1) Divê daxwaznameya serlêdanê van agahiyên li jêr li xwe bigire;

- a) Hejmara Nasnameyê
- b) Adresa ku di belgeya qeyda nifûsê de hatiye.
- c) Orjînal an kopia tesdîqkirî ya dîploma, destûrname yan sertîfîkaya ku jêhatîbûna zimanî nîşan dide. Di rewşa nebûna belgeyên wiha de, pêwîstî bi beyaneke nivîskî heye ku jêhatîbûna têrker ya zimanî ji bo pêkanîna xebatên wergerê nîşan dide.
- d) Du wêneyên di forma wêneyên pasaportê da,
- e) Orjîнала belgeya ku statuya perwerdeyê ya serlêderî nîşan bide an jî kopia wê ya ku ji aliyê komîsyonê ve hatiye tesdîqkirin.

(2) Heger ku serlêder di listeya sala borî de qeydkirî be, agahî û belgeyên ku di bin paragrafên (a), (c) û (e) yê ya paragrafa yekem de hatine destnîşankirin ji wan nayên xwestin.

Nirxandina serlêdanan

Xala 9 - (1) Divê Komîsyon serlêdanan, navên serlêderan, zimanên asayî û zimanê îşaretan ku pê diaxivin, sazî û rêxistinên ku lê dixebitin (eger hebin) û navnîşanên wan ên tam tomar bike.

(2) Komîsyon dê heta 30ê Çiriya Paşîn serlêdanan binirxîne û ger belgeyên ku di xala 8'ê de amaje bi wan hatiye kirin kêmas bin, an jî serlêder şertên ku di xala 6'ê de hatine diyarkirin pêk neyne, serlêdan tê red kirin. Dê biryara redkirinê ji serlêderî ra bê ragihandin.

(3) Di lîsteyê dê navên serlêderên ku serlêdanên wan hatine qebûl kirin, ziman an zimanên ku pê dipeyivin û cureyê zimanê îşaretan ku tê de jêhatî ne, navên sazî û rêxistinên ku serlêder lê dixebitin (heke hebin) û navnîşanên wan ên tekûz li xwe bigire. Lîste dê di salonên dadgehan da bê daliqandin û dê di medyaya elektronîk de bê weşandin.

Sond û Binemayên Exlaqî

Xala 10 - (1) Serlêderên ku cara ewil e ji lîsteyê tene zêdekirin û kesên ku bi dilxwazî ji lîsteyê hatine derxistin û ji nû ve hatine pejirandin, dê li gor xala pêncem a madeya 64ê ya Qanûnê di rojek an jî çend rojên taybet de, ku berê ji aliyê Komîsyonê ve hatine diyarkirin û ragihandin, sondê bixwin.

(2) Divê wergêr di pêkanîna erkên xwe de li gor binemayên exlaqî yên jêrîn tevbigerin:

- a) Serxwebûn.
- b) Bêalîbûn.
- c) Rastgoyî û gotina rastiyê.
- d) Bicihanîna peywirê.
- d) Aşkeranekirin.
- e) Rêzgirtin ji binemayên bingeîn ên dadgêriyê.

weşandina lîsteyê

Xala 11 - (1) Divê nusxeyek ji lîsteya wergêrên sondxwarî heta 31ê Kanûna Pêşîn ji Rêveberiya Giştî ya Karûbarên Sizayî û Rêveberiya Teknolojiya Înformasyonê ya Wezareta Dadê û ofîsa dozgeriya komarê ya navend û navçeyê re bê şandin, da ku ji dadgehan re bê ragihandin. Her wiha divê ku lîste li salona dadgehê jî bê daliqandin.

(2) Lîsteyên ku ji aliyê komisyonan ve hatine amadekirin û ji Rêveberiya Teknolojiya Înformasyonê ya Wezareta Dadê re hatine şandin, dê bîn yekkirin û dê di Bultena Qanûnê Dadgêriyê û medyaya elektronîkî de bîn weşandin.

Lêçûnên Wergêr

Xala 12 - (1) Nabe ku lêçûnên wergêr ku ji bo gumanbar, bertawan, qurbanî an jî şahidê ku bi tirkî nizane an jî wî zimanî di asteke baş de nizane/an astengdar e, wekî lêçûnên dozê bîn hesibandin û divê ew lêçûn ji hêla Xezîneya Dewletê ve bê dabînkirin.

(2) Lêçûnên wergêr ku bertawanî di çarçoveya benda çaremîn ya xala 202yê de ji lîsteya Komîsyonê hilbijartiyê, ji xezîneya dewletê nayê dayîn. Di vê rewşê de, divê dadgeh lêçûnên wergêr û herwiha wê derfetê dîyar bike ku divê ew lêçûn li ofîsa kaseyê bê razandin.

Dirêjkirina darizandinê

Xala 13 - (1)

Li gor benda çarem a xala 202'yê ya qanûnê, nabe ku mafê sûdwerigirtina ji xizmetên wergêrî bi armanca dirêjkirina dozê bê bikaranîn.

Sedemên Jilîstderxistinê

Xala 14 - (1) Wergêrên ku ji lîsteyê hatine zêdekirin, dê bi pêkhatina mercên jêrîn ji lîsteyê bêne derxistin:

- a) Şertên ku ji bo pejirandina di lîsteyê de hatibe berçavgirtin, ji holê rabin.
- b) Bêyî hebûna sedemeke qanûnî xwe ji pêkanîna karê wergerê dûr bigirin.
- c) Wergêr bixwe daxwaz bikin ku ji lîsteyê bên derxistin,
- d) Wergêr helwest û tevgerên li dijî wan binemayên exlaqî nîşan bidin ku di paragrafa duyem a Xala 10ê de amaje pê hatiye kirin.
- e) Wergêr ji ber pêkanîna tawanên ku di jêrparagrafa (e)yê ya paragrafa yekem a xala 6ê hatibe sizadan an jî di çarçoveya dozekî têkildarî wan tawanên da hatibe darizandin, lê ragihandina biryarê hatibe paşxistin.

(2) Heger ji ber tawanên paragrafa (e)yê ya paragrafa yekem a xala 6ê li dijî wergêrî dozek hatibe vekirin, dê navê wî/wê ji lîsteyê bê taloqkirin. Ew taloqkirin dê di rewşa bêtawanderketinê de were rakirin.

Pêvajoya Jilîstderxistinê

Xala 15 - (1) Heger şert û mercên ku di xala 14'an de hatine destnîşankirin pêk bên, dê navê wergêrî bi biryara Komîsyonê ji lîsteyê bê derxistin.

(2) Biryara Komîsyonê ya jilîstderxistinê dê li gor prosedoren xala 11ê ji kesê têkildar re bê ragihandin.

Pêvajoya Nûkirina Lîsteyan

Xala 16 - (1) Divê lîste her sal li gor bendên vê peyrewê ji nû ve bên dariştin.

BEŞA SÊYEM

Rêzikên cûrbicur û dawî

Berhevkirina lîsteya wergêran a sala 2013an

XALA DEMKÎ 1 - (1) divê Komîsyon piştî ketine merîyetê ya vê peyrewê, di nav sê mehan de lîsteya wergêran li gor bendên vê peyrewê amade bikin.

Meriyet

Xala 17 - (1) Ev peyrewê dê ji dema ku tê weşandin, bikeve warê meriyetê.

Cîbicîkriin

Xala 18 - (1) xalên vê peyrewê dê ji aliyê Wezîrê Dadê ve bêne cîbicîkirin.

Dozên ku li gor xala 202yê ya Qanûna Rêkarên Darizandina Sizayî ya Tirkîyeyê (CCP) wergêr dikarin tê da amade bin:

(1) Heger ku bertawan an qurnabî di astekî de ku bikaribe xwe îfade bike, bi tirkî nezane, divê wergêrê ku ji hêla dadgehê ve hatî erkdarkirin, di danişînê de xalên bingeîn ên têkildarî angaşt û parastinê wergerîne.

(2) Divê xalên bingeîn yê têkildarî angaştê û parastinê bi awayekî ku ji bo wan fêmbar be, ji bertawan an qurnabiyê xwedî pêdawîstiyêke taybet bêne rawekirin.

(3) Rêzikên paragrafa yekem û duyem di derbarê gumanbar, qurbanî û şahidên ku di qonaxa lêpîrsînê de hatine guhdarîkirin jî derbasdar in. Di wê qonaxê de wergêrê dê ji aliyê dadger an jî dozgerê giştî ve bê tayînkirin.

(4) (Paragrafa ku di 24/1/2013 ji xala 1ê hatiye zêdekirin; Qanûna hejmar: 6411) Herwiha (1)

(a) Li ser pêşkêşkirina angaştnameyê,


(b) Di vê rewşê de, karûbarên wergerê dê ji aliyê wergêrê ku ji hêla bertawanî ve ji nav listeya amadekirî li gor Paragrafa 5ê bê hîlbijartin. Nabe ew serpişkî bi mebesta darizandinê darizandinê bê bikaranîn. Lêçûnên wî wergêrê dê ji aliyê Xizîneya Dewletê ve neyên dabînkirin.

(5) (Paragrafa ku di 24/1/2013 ji xala 1ê hatiye zêdekirin; Qanûna hejmar: 6411) Wergêrê dê ji nav listeya ku her sal ji aliyê komîsyonên dadgêriyê yê parêzgehan ve tê çekirin, bêne hîlbijartin. Dozger û dadger dikarin wergêran ne tenê ji listeyên ku li parêzgeha wan hatine berhevkirin, herwiha ji listeyên ku li parêzgehên din hatine berhevkirin jî hîlbijêrin. Prosedur û rêzikên têkildarî berhevkirina wan listeyan dê bi peyrewan bêne diyarkirin.



Anketa 225 bertawanên ku xwastine di pêvajoyên dadgêriyê da zimanê Kurdî bi kar bînin

Anketa 225 bertawanên ku zimanê wan yê yekem Kurdî ye, di dozên hiqûqî da, di hemû qonaxên pergala dadgêriyê da, ji sala 2016ê heya 2022yê. Armanca vê anketa diyarkirina standarda dabînkirina xizmetên wergera Kurdî-Tirkî di dadgehên Tirkîyeyê da û nirxandina ezmûna wan tawanbaran e ku xwastine parastin, îfade û delîlên xwe bi zimanê dayikê araste bikin.




P1 Tu bi kîjan zaraveya kurdî dipeyivî?






P2 Gelo di heyama pênc salên borî de te wekî gumanbar an tawanbar di nav dozê de cih girtiye?




P3 Gelo beriya ku tu îfadeyên xwe bidî, tometên li dijî te û mafên te bi zimanekî ku tu jê fam dikî ji te re hatin ravekirin?




P4 Dema ku polisî/dozgerî îfadeyên te girtin û herwiha di heyama lêpîrsînê dadgeha hiqûqî/medenî de, gelo ji te re hat gorin ku mafê te heye zimanê xwe bi kar bînî?



P5 Gelo te di maweya wergirtina îfadeya xwe de an/û di dema lêpirsînên dadgehê de xwesteka xwe ya bikaranîna zimanê dayikê anî ziman?




■ Erê ■ Ne ■ Bê bersiv




■ Erê ■ Ne ■ Bê bersiv

P6 Gelo xwesteka jorîn (P5) hate pejirandin?




■ Erê ■ Ne ■ Bê bersiv

Ev grafîk 44 kesên (ji 118 bertawanên pîrsa borî) temsîl dike ku daxwaza wan ya bikaranîna zimanê Kurdî di dadgehê de hatiye qebûl kirin.



■ Erê ■ Ne






■ Erê ■ Ne

P7 Heger ku daxwaza te hat qebûl kirin, kî rola wergêrê pêk anî?

- Gardiyanê zindanê
- Daxwaz nehate qebûl kirin.
- Wergêrek ji Komîsyona Darizandina Dadmend
- Çaqî

* Ji 225 bersivên vegotinê hilbijêrin.


P8 Gelo peydakirina wergêrî wextê dayîna îfadeya te dirêjtir kir?





*Li gor hejmara bersivên derbasdar hatiye dariştin.

P9 Heger bersiva te ya p. 8ê (P8) 'Erê' be, gelo evê çendê wextê dayîna îfadeya te çiqasî dirêj kir?

- Ew bi qasî peydakirina wergêrî dirêj bû.
- Du roj
- Ji sedî 80 dirêj bû.
- Sê meh.



P10 Gelo bi raya te wergêrî tometên li ser te, pirsên ku hatine kirin û îfadeyên te bi awayekî tekûz ji bo te vergerandin?





*Li gor hejmara bersivên derbasdar hatiye dariştin.

P11 Heger tu difikirî ku wergêrî di warê wergerandina tometan, pirsên ku hatine pirsîn û şîroveyên te de, rola xwe bi awayekî tam pêk neaniye, tu çima wisa difikirî? (bo nimûne: cûdahiya zaravayê? pêşdaraz? Li şûna ku tiştên te gotî ji dadgehê re bibêje, kurteya wan goriye?)


- Kurdiya wan cuda û akademîk bû.
- Cudahiya devokan, zehmetiya wergêrî di kurtkirin û gihandina wateyê de, dijiwariya têgihên hiqûqî pêşdaraz
- Cudahiya zaravayî û lawaziya di bikaranîna zimanê dayikê da.

* Ji 225 bersivên vegotinî hilibijêrin.

P12 Dema ku te di pêvajoya lêpîrsînê de daxwaza bikaranîna zimanê dayikê kir, polîs, dozger an jî dadgerî tiştek gorin an bertekê nîşan dan?






P13 Heger ku bersiva te ji bo pîrsa li jor (P12) “erê” be, polîs, dozger an jî dadgerî çi got û çi bertek nîşan da? Hesta te di vê derbarê de çi bû?



- “
- Zimanekî nenas
 - Dema ku min hewil de zimanê xwe yê dayikê bikar bînim, di dadgehê de nîqaşek derket.
 - Ji min re hat gotin ku heger bixwazim di dema dadgehê de bi zimanê dayika xwe bipeyivim, dê encamên nerênî derkevin holê.
 - Ji min re gotin ku pêwîst nake û heger ez zimanê xwe bikar bînim, dê rewş xirab be.
- ”

* Ji 225 bersivên vegotinî hilbijêrin.

P15 Heger ku tu di pêvajoya lêpirsînê de hatî sizadan, gelo bi raya te daxwaza parastinê û/an xweparastina bi zimanê dayikê bandorek li doza te kiriye?



P16 Heger ku bersiva te ya pirsê li jor (P15) 'Erê' be, çi tiştek bû sedem ku hûn gihîştin vê encamê?




- Min nedikarî bi zimanê xwe bipeyivim û ji ber wê jî min nedikarî îfadeya xwe bidim. Wan digot: "Hûn li welatê Tirkiyeyê dijîn, hûn dê bi zimanê Tirkî peyivin."
- Xwestina min a parastina bi zimanê dayikê wekî helwesteke bîrdozî hate nirxandin. Cudakarî hebû.
- Ez nikarim şarmendekî wekhev bim.
- Wan angaşt kir ku kurdî ne ziman e û di heman demê de daxwaza min a axaftina bi zimanê kurdî di encama zexta rêxistineke terorîstî de pêk hatiye.




* Ji 225 bersivên vegotî hilbijêrin.


P17 Di kîjan asta dadgehê de peyketina doza te hat kirin?



- Dadgeha Bilind ya Sizayî
- Dadgeha Sizayî ya Destpêkê
- Dadgehên Medenî
- Bê bersiv




- Dadgeha Bilind ya Sizayî
- Dadgeha Sizayî ya Destpêkê
- Dadgehên Medenî
- Bê bersiv



- Erê
- Ne
- Bê bersiv


P18 Gelo belgeyên di dosyaya te de bi zimanê dayikê ji te re hatin şandin?



Erê


Na

*Li gor hejmara bersivên derbasdar hatiye dariştin.




- Erê
- Ne
- Bê bersiv

P19 Gelo te angaştnameya ku der barê te de hatibû amadekirin an jî tawanên di angaştnameyê de fêm kir?





■ Erê ■ Ne ■ Bi qismî ■ Bê bersiv






■ Erê ■ Ne ■ Bi qismî ■ Bê bersiv



P20 Gelo beriya darizandinan ji te hat pirsîn ku tu qebûl dikî heqdestê wergêrekî bixwe bidî an na?



P21 Gelo te dizanî ku te di dadgehê de mafê bikaranîna zimanê dayikê heye?



P22 Gelo te di heyama rûniştinan de daxwaza bikaranîna zimanê dayikê kir? (an bixwe an jî bi rêya nûnerê xwe yê qanûnî)




*Li gor hejmara bersivên derbasdar hatiye dariştin.



P23 Di dadgehê de çawa behsa zimanê te hat kirin?

- *Kurdî*
- *Zimanê nenas*
- *Tirkî*
- *Şîrovevên din - Zimanê min ne wek zimanê gelekî, lê wekî zimanê propagandaya rêxistinekê dihat dîtin.*
- *Zimanekî nexwestî*
- *Nayê bîra min.*

* Ji 225 bersivên vegotini hilbijêrin.



P24 Gelo di dadgehê de, te çi şîrove an bersivên dadger û/an jî dozger ne di cih de an jî wekî heqaret dît?






*Li gor hejmara bersivên derbasdar hatiye dariştin.

P25 Heger ku bersiva te ji bo pirsê jor (P24) "Erê" be, ji kerema xwe diyar bike ka çi şîrove an bersiv hatin dayîn?


- Tu Tirkî dizanî û vir Tirkîye ye, çima wê pêdagiriyê dîkin?
- Bi awayekî cudakarane hate redkirin.
- Ez wekî terorîstekî cudaxwaz hatim binavkirin.
- Binavkirina wê wekî zimanekî nenas mezintirîn heqaret bû.

* Ji 225 bersivên vegotî hîlbijêrin.



P26 Gelo ji te re hat pêşniyazkirin ku ji bo bilezbûna peyketinê dest ji wergêrê berdî?



*Li gor hejmara bersivên derbasdar hatiye dariştin.



P27 Gelo dadgehê rê da we ku hûn zimanê xwe yê dayikê bikar bînin?






*Li gor hejmara bersivên derbasdar hatiye dariştin.

P28 Ger ku dadgehê rê neda te ku tu zimanê kurdî bikar bînî, bersiva te çi bû?

- Daxwaz nehate pejirandin.
- Wergêr tune ye.
- Li Tirkiyeyê tu zimanekî bi navê Kurdî tune ye.
- Wan got, "Ev der Komara Tirkiyeyê ye, xalên Qanûna Bingehîn bi vî rengî ne ku hûn ê angaştnameya xwe bi zimanê fermî bidin".

* Ji 225 bersivên vegotini hilbijêrin.

P29 Gelo bi raya te kêmasiyên di têgihiştinê de an hatinfamkirinê de bandor li encamên darizandinê kirine?




P30 Heger ku bersiva te ji bo pirsê li jor (29) “Erê” be, gelo dikarî zêdetir şîrove bikin?


- *Kurdî zimanê min ê dayikê ye û ez dikarim xwe bi zimanê xwe rehetir îfade bikim*
- *Ez ji mafê îfadekirina bi zimanê xwe hatime bêparkirin.*
- *Ez bawer im ji ber ku min nikarî xwe bi temamî îfade bikim, bandora wê hebû.*
- *Îfadeyên ku di dema binçavkirina polîsan de têne dayîn bi Zelalî nayên wergerandin, an jî bi zanebûn şaş têne wergerandin.*

* Ji 225 bersivên vegotîni hilbijêrin.


P31 Gelo tu difikirî ku dadgeh ji ber bikaranîna zimanê dayikê yan jî daxwaza te ya parastina bi zimanê dayikê, li hember te bi awayekî neyînî tevgeriyaye?



■ Erê ■ Ne ■ Bê bersiv




■ Erê ■ Ne ■ Bê bersiv






P32 Heger ku te ji bo pirsê jor (P31) bersiva 'Erê' dabe, gelo tu dikarî li ser kêşeya neyînî ya ku te ji yaye şîrove bikî?

- Ez ditirsiyam ku ew dê sizayekî girantir bidin min.
- Ew wekî nêzîkatiyeke siyasî yan jî şikleke protestokirinê tê dîtin û gumana ku te sûc kiriye zêde dike.
- Pêşdaraz.
- Bijardeya bikaranîna zimanê xwe nedan min.

* Ji 225 bersivên vegotini hilbijêrin.





P33 Gelo tu dixwazî li dadgehên Tirkîyê xizmetên wergêra kurdî/ tirkî ya standardkirî, bi qalîte, profesyonel bibînî?



*Li gor hejmara bersivên derbasdar hatiye dariştin.

P34 Gelo bi raya te baş dibe heger ku standard û pîvanên pêwîst ên ku wergêrên kurdî li gor wan tevbigerin werin dariştin?



P35 Gelo çî xalên din hene ku tu bixwazî têkildarî serpêhatiya xwe ya daxwaza bikaranîna zimanê dayikê li hola dadgehê parve bikî?

- Min qet destûra wê çendê nebû ku parastina xwe bi zimanê xwe bikim.
- Divê her kes bikaribe bi awayekî azad bi zimanê xwe parastina xwe bike.
- Nabe ku parastina bi zimanê dayikê ew qas zehmet be.
- Bikaranîna zimanê dayikê ne tawan e.

* Ji 225 bersivên vegotîni hilbijêrin.

Hevpeyvînên bi wergêran ra

Ji bo ku qanûna wergerê bi berçavka wergêrên ku di.. xebitin jî were fêmkirin, PENa Norwecê bi gelek wergêrên ku di navbera kurdî û tirkî de karê wergerê dikin anek çêkir û pirsên li jêr ji wan kirin.

■ Ev çend sal in ku tu wekî wergêrê Kurdî-Tirkî dixebitî?

Bersivdêr A: 2 sal

Bersivdêr B: 7 sal

■ Te heya niha çend caran li dadgehê wekî wergêr kar kiriye?

Bersivdêr A: Heta niha ez beşdarî 4 rûniştinan bûme.

Bersivdêr B: Daxwazên wiha pir kêr in, hin mehan em ji bo yek an du dozan wergerê dikin, lê carinan ji bo du mehan jî tu daxwazek ji me re nayê.

■ Bi dîtina te, standardên têkildarî wergerê bi giştî, di hemû astên sîstema dadgêriyê da çawa ne? (ev ne ji bo zelalkirina jêhatîbûna te ye, lê pirseke giştî ye) 1. Pir baş e 2. Têrê dike 3. Lawaz e 4. Pir lawaz e 5. Bê şîrove.

Bersivdêr A: 3. Lawaz e.

Bersivdêr B: 4. Pir lawaz e.

■ Gelo bi raya te di dadgehan de li hember bertawanên ku dixwazin bi kurdî biaxivin pêşdarazî heye? Heger ku bersiva te erê be, gelo tu dikarî bêtir rawe bikin?

Bersivdêr A: Ez nikarim bibêjim ku li hember tawanbarên ku bi kurdî diaxivin pêşdarazî heye. Mixabin ez nikarim bibêjim ku ev sereberî ji yê din cuda ye yan na, ji ber ku ji bilî Tirkî û Kurdî ez nebûme şahidê tu parastinên din. Lê min heta niha reftareke neyînî nedîtiye.

Bersivdêr B: Belê, hûn dikarin bi zelalî nêzîkatiya pêşdarazî li

hin dadgeh û navendên polîsan bibînin. Bo nimûne, dema ku diyaloga di navbera bertawan û wergêrî dihat qutkirin, em bi wan endamên dadgehê re rûbirû diman ku helwestên tinazî nîşan didan. Di heman demê de em rastî wan endamên dadgehê dihatin ku digotin ji ber ku bertawan dikare bi tirkî bi xavî, wergêr hewce nake.

■ Gelo hûn qet ji ber axaftina bi kurdî ya tawanbarekî li salona dadgehê, rastî cudakariya li hember wî/wê hatin? Heger ku bersiva we “erê” be, ji kerema xwe hûn dikarin mînakê an jî çend mînakên bidin?

Bersivdêr A: Ez nebûme şahidê tu awayekî cudakariya li dijî kesên ku parastina xwe bi kurdî dikirin. Ez bawer im ku dadgêr kêmtir li ser vî yekê haydar in û dizanin ku ev mijar xalek hestiyar a civakî ye.

Bersivdêr B: Di yek ji rûniştinên dawî yên ku ez beşdar bûm de, di navbera dadgêr û bertawan de lihevnekirinek derket. Dadgêrî bi dengê bilind şîret li min û bertawanê kir. Ez bawer dikim ku ev yek helwesta alîgir a dadgehê nîşan dide. Ez dikarim mînakên din jî pêşkêş bikim.

■ Tu qet Ji ber pîşeya xwe rastî cudakariya endamên organên dadgêriyê hatî? Ger ku bersiva te erê be, tu dikarî nimûneyan bidî?

Bersivdêr A: Ji ber ku tê zanîn em hiqûqnas in û her wiha wergêrên kurdî ne, di vî warî de ez rastî tu serederiyeke xerab ji aliyê dadgêr û lijneya dadgêriyê ve nehatim.

Bersivdêr B: Bi raya min, dema ku serokê dadgehê li min kir qîrîn, şîret li min kir û biryar da ku di dawiya dadgehê de mûçeyê kêmtir bide min, ew bixwe mîna keke cihêkariyê bû. Bi heman awayî, hin dadgeh pereyekî kêmtir didin wergêran.

■ Gelo hûn li gor hevkarên xwe yên ku bi zimanên din xizmetên wergerandinê pêşkêş dikin, heqdesteke wekhev distînin?

Bersivdêr A: Min heya niha ji bo xizmetên wergerê tu heqdest nexwastîye û dadgehan jî der barê lêçûnên wiha de tu biryar nedane.

Bersivdêr B: Ez ne bawer im ku heqdestê min û wergêrên zimanên din wekhev be.

■ Gelo bi raya te di warê xurtkirina rêzikên têkildarî wergêrên Kurdî-Tirkî de li dadgehan pêşkeftin heye?

Bersivdêr A: Pirsgerêkên ku di hemû pêvajoyên hiqûqî yên li Tirkîyeyê de tên dîtin, di vir de jî hene; bi giştî, di pergaleke bi kêmasî de werger jî derbê dibîne. Hin dadgeh wergêrên ku bertawan û parêzeran anîne red dikin û li şûna wan wergêran jî listeyê vedixwînin, ev jî dibe sedema taloqkirin û dirêjkirina dozê.

Bersivdêr B: Divê teqez pêşketinek çêbe.

“Pirsgerêkên ku di hemû pêvajoyên hiqûqî yên li Tirkîyeyê de tên dîtin, di vir de jî hene; bi giştî, di pergaleke bi kêmasî de werger jî derbê dibîne. Hin dadgeh wergêrên ku bertawan û parêzeran anîne red dikin û li şûna wan wergêran jî listeyê vedixwînin, ev jî dibe sedema taloqkirin û dirêjkirina dozê.”

■ **Gelo tu hebûna listeyeke wergêrên jêhatî li Tirkîyeyê ku çavdêriya wê tê kirin, ji bo dadgehên her herêmekê erê dikî?**

Bersivdêr A: Helbet. Pêwîst e ku ji aliyê rêxistinên serbixwe ve piştgiriya wergêran bê kirin. Gelek pêwîst e ku mafê parastinê, bi taybetî parastina bi zimanê dayikê bê pêşxistin. Divê ev yek bê teşwîqkirin û li ser vê mijarê raporên objektîf bên amadekirin.

Bersivdêr B: Belê, ez erê dikim. Di warê wergêrê de pêdivî bi standardên bilindtir heye û divê bi awayekî ciddî nêzik bibin.

■ **Gelo bi raya te dabînkirina hevsengiya zayendî di listeyên wisa de pêkan e?**

Bersivdêr A: Bi dîtina min, dema ku mirov rewşa niha ya Tirkîyeyê berçav digire, ne tenê di warê wergerê de, di tu warî de pêşkeftin û rêkûpêkkirina li ser bingehe wekheviya zayendî pêkan nîne.

Bersivdêr B: Heger ku îrade hebe, bêguman pêkan e ku wekheviya zayendî pêk bê. Lê ez bawer nakim kesên berpirsiyar xwedî wê ferasetê bin. Ez di vê çendê de bi guman im ku ew di çêkirina listeyan de wekheviya zayendî esas bigirin, lewra di metoda heyî ya çêkirina listeyan de tu çarçoveyeke pêşkeftî nayê esasgirtin.

■ **Di warê zimanê kurdî, zimanê tirkî û/an wergerê de asta we ya herî bilind çi ye? Dîplomaya lîseyê / belgeya Zanîngehê / dîplomaya masterê an doktorayê? Û gelo we ji aliyê sîstema dadgêriyê yan jî di çarçoveya kurseke zanîngehê da perwerdeya wergerê ditiye?**

Bersivdêr A: Ji bo ku ez bibim wergêrê zimanê kurdî, min tu perwerdeyek nedît. Ez axaftina bi Kurdî ji malbata xwe hîn bûm. Ez ji pirtûk û perwerdeyên hin komeleyên serbixwe hînî nivîsandin û xwendina zimanê Kurdî bûm.

Bersivdêr B: Ez xwedî bawernameya karzaniyê me, lê ne pêkan e ku mirov perwerdeya fermî ya zimanê Kurdî bibîne. Ez demekê li Stenbolê beşdarî perwerdeyên Enstîtuya Zimanê Kurdî bûm. Kurdî zimanê min ê dayikê ye. Ez wî zimanî baş dizanim.

■ **Gelo hûn dizwazin tiştekî din bibêjin?**

Bersivdêr B: Heger ez bixwazim tiştekî zêde bikim, ez dikarim bêjim li gor min pêwîst e xebatên ji bo pêşxistin, ronîkirin û berfirehkirina pratîka xweparastinê bi hemû zimanên zikmakî, ne tenê bi kurdî, bi lez bêne zêdekirin. Di vî warî de, ez spasiya we hemûyan dikim. Gelek spas ji bo hemû hewldanan. Ez serkeftinên mezin ji we re dixwazim.

Bersivdêr B: Na ez naxwazim tiştekî din zêde bikin.

Hevpeyvînên bi parêzeran ra

Bi armanca
fêmkirina
rewşa heyî ji
perspektîfa
parêzerên ku
bi xwesipêrên
kurdîaxêv re
dixebitin, PENa
Norwecê li gel
gelek parêzerên
ku hema hema tenê
bi xwesipêrên
Kurd û kurdîaxêv
re kar dikin jî
anketek çêkir.
Pirs û bersivên
hilbijartî li jêr
hatine rêz kirin.

■ Gelo hûn wekî parêzer bi piranî li dadgehê nûnertiya wan kesian dikin ku zimanê wan yê zikmakî Kurdî ye yan jî tenê bi kurdî diaxivin?

Bersivdêr B: Her çî qas ku hin dadgeh di her rûniştinê de destûr didin ku parastina bi amadebûna wergêrî pêk bê, hin dadgeh hene ku dibêin tenê di rûniştina yekem de ku lêpîrsîn pêk tê û di rûniştina dawî de ku parastina gewherî pêk tê, mafê tawanbaran heye bi alîkariya wergêrî parastina xwe bikin. Ew dadgêr di rûniştinên din de destûr nadin ku parastin bi amadebûna wergêrî pêk bê.

Bersivdêr B: Ne pir caran.

■ Xwesipêrên we yên kurdîaxêv çend caran daxwaza wergêrî dikin?

Bersivdêr A: Hin xwesipêrên me hene ku heger bîr girtin, di her rûniştinê de daxwaza wergêrî dikin. Tevî ku hin dadgeh di her rûniştinekê de destûra parastina bi wergêrî didin, hin dadgeh dibêjin bertawan tenê dikarin di rûniştina yekem de ku lêpîrsîn pêk bînin û di rûniştina dawî de ku parastina gewherî pêk bînin, parastina xwe bi amadebûna wergêrî pêk bînin. Ew dadgeh rê nadikin ku di rûniştinên din de parastin bi amadebûna werhêran pêk bê.

Bersivdêr B: Ew hertim daxwaz dikin.

■ Gelo tu caran çêbûye ku xwesipêrên we tevî ku zimanê wan ê zikmakî Kurdî be jî, daxwaza wergêrî nekin yan jî ji vî yekê nerazî bin? Nimûneyên weha di kîjan şert û mercan de derketine/ diqewimin?

Bersivdêr A: Têkoşîna girtiyên siyasî ji bo parastina bi zimanê dayikê xwedî dîrokek dirêj e. Ji ber ku ew maf bi têkoşînên siyasî hatiye misogerkirin, kesên ku meyla bikaranîna vî yekê dikin, ji tîrsa ku ew maf wekî helwesteke siyasî bê şîrovekirin, dudil dimînin. Ji ber ku ji aliyê dewletê ve tê qebûl kirin ku bikaranîna wî mafî di encama têkoşîneke siyasî de hatiye bidestxistin, bi dadgehan re meyla vî çendê heye ku daxwazeke bi vî rengî wekî daxwazeke siyasî binirxînin. Ev rewş rê li ber bikaranîna wî mafî digire.

Bersivdêr B: Dibe ku hin xwesipêr wê çendê tercîh bikin da ku pêvajoyê dirêj nebe. Ez bixwe rastî vê yekê nehatime, lê min bihîstiye ku hin xwesipêran ji tirsê girtinê, bi taybetî di qonaxên lêpirsînê de îfadeya xwe ya parastinê bi zimanê xwe yê dayikê nedane.

■ **Bi berçavgirtina hemû qonaxên pêvajoya dadgêriyê, hûn standardên têkildarî xizmetên wergera Kurdî-Tirkî çawa dinirxînin? (1 – pir baş, 2- Têrê dike, 3- lawaz e, 4- Pir lawaz e, 5- Bê şîrove)**

Bersivdêr A: Li Diyarbakirê lawaz û li Tirkiyeyê bi giştî pir lawaz e.

Bersivdêr B: Di navbera lawaz û têrêkirinê da. Bi taybetî li parêzgehên piçûk ên rojavayê Tirkiyeyê (bo nimûne li Kocaeliyê) her gav ne pêkan e ku mirov wergêrên baş peyda bike.

■ **Gelo bi raya te li hember bertawanên ku dixwazin di dema darizandinê de bi Kurdî biaxivin pêşdaraz heye? Heger ku bersiva we erênî be, gelo hûn dikarin bêtir agahî bidin?**

Bersivdêr A: Dadger bikaranîna wî mafî wekî kiryardê siyasî dihesibînin û vê yekê wekî nîşaneyê helwesteke rêxistinî dinirxînin. Heger ku doz rê nede wan ku di vî warî de biryarê bidin, wê demê dadger gelek caran hewl didin ku pêşî li mafê parastina bi kurdî bigrin û di dozên dadgehê de destnîşan dikin ku wê/wî kesî li dibistanê xwandiye û ji ber vê yekê jî bi tirkî şareza ye.

Bersivdêr B: Ji bo me ev yek aşkera ye, ji ber ku min pir caran tiştên wiha bihîstine ku dibêjin: “Heger te bi tirkî biaxivîya, min û te dê beraet bikira”. Aşkera ye ku pêşdarazî û gef hene. Lijneya dadgeran ji bilî ku bi gotinên xwe bi awayekî aşkera nêrîna xwe tînin zimên, bi helwest û tevgera xwe jî nîşan didin ku ji parastina bi zimanê dayikê û nemaze ji pêvajoya wergerê bêzar bûne. Axaftina bi kurdî ku zimanê dayikê yê bertawanê e, mîna bikaranîna mafê bêdengiyê wekî helwesteke rêxistinî tê dîtin; bi vî awayî lijneyên dadgêriyê û dozger bikaranîna wî mafê bingeîn sîzanasî dikin.

■ **Gelo qet dozek hebûye ku bertawan bi Kurdî axaftibe, û wê çendê bandor li ser encamên dozê kiribe?**

Bersivdêr A: Ez dixwazim ji bûyereke ku min bi salan berê li 10emîn Dadgeha Sizaya Giran a Diyarbakirê jiyabû, nimûneyekê bidim. Xwesipêrê min di her rûniştinekê de parastina xwe bi Kurdî kir û nehat berdan. Di rûniştina dawî de, ji ber ku wergêr nehat dîtin, xwesipêrê min parastina xwe bi Tirkî kir û serbest hatin berdan. Bertawanekî din ê ku bi heman rewşa xwesipêrê min bû, di heman rojê de beşdarî rûniştina dozê bû, lê ji ber ku xwest parastina xwe bi zimanê Kurdî bike, wê rojê nehat berdan. Em di wê baweriyê de ne ku di hin dozên me de, ji ber nêrîna nerênî ya dadgehan li ser xweparastina bi zimanê Kurdî, xwesipêrên me nehatine berdan. Ji aliyekî din ve, em şahid in ku hin dadgeh û dadgêr di vî warî de bê pêşdaraz nêzîk dibin.

Bersivdêr B: Nimûneyeke berbiçav tune ye, lê carinan hûn dikarin wê nêzîkbûnê hîs bikin.

Karmendên dadgehê ji bo ku dahatek zêdetir bistînin, ji bo cihgirtin di wê listeyê de serlêdanê dikin. Ji ber wê jî ew liste tijî wan wergêrên bê qalîte ye ku nikarin astengiya zimanî ji holê rakin. Ew wergêr li şûna ku karê wergerê bikin, pir caran kurteya tiştên ku hatine gotin araste dikin an jî şîroveyên xwe lê zêde dikin. Ev jî dibe sedem ku xizmeteke wergerê ya bi kêmasî bê pêşkêşkirin.

■ Gelo hûn di wê baweriyê de ne ku divê di dadgehê de wergera Kurdî-Tirkî were xurtkirin?

Bersivdêr A: Hin dadgeh rê didin me ku em bi derfetên xwe wergêran peyda bikin lê hin dadgehên din jî hene ku tenê wan wergêran qebûl dikin ku di listeya pisporan de cih digirin. Karmendên dadgehê jî bo ku dahatek zêdetir bistînin, jî bo cihgirtin di wê listeyê de serlêdanê dikin. Ji ber wê jî ew liste tijî wan wergêrên bê qalîte ye ku nikarin astengiya zimanî jî holê rakin. Ew wergêr li şûna ku karê wergerê bikin, pir caran kurtiya tiştên ku hatine gotin araste dikin an jî şîroveyan xwe lê zêde dikin. Ev jî dibe sedem ku xizmeteke wergerê ya bi kêmasî bê pêşkêşkirin. Helbet ew qadek e ku divê bê başkirin.

Bersivdêr B: Bê guman divê çavdêriya jêhatîbûna wergêran bê kirin. Divê wergêrê ku standardan pêk nayîne bê destnîşankirin û pêvajoyek çavdêriyê hebe. Carinan dadger bi dîlnîzmî jî parêzer an jî fermanberên dadgehê yên ku bi Kurdî diaxivin daxwaza piştgiriya dikin. Ji ber vê sedemê jî başkirin hewce ye, jî ber ku binemayên herî bingeîn ên dadgêriyê têne bînpêkirin (tenê wekî mînak).

■ Gelo hûn piştgirî bidin fikra amadekirina listeyên wergêrên bi qalîte jî bo dadgehên li hemû herêmên Tirkîyeyê, ku bi awayekî serbixwe bîr şopandin û çavdêriya wan bê kirin?

Bersivdêr A: Helbet, em alîgirê her piştgiriyeke serbixwe ne jî bo wan. Lêbelê, ew kesên ku di nav listeyên pisporan de cih digirin, li ser bingeha her lêpîrsîneke ewlehiyê dikarin tavilê jî wan listeyan bêne derxistin. Rîskek bi wî awayî rê li ber wê çendê digirre ku pispor bi strukturên wiha jêhatî û serbixwe re di heman wêneyê de cih bigirin. Ji bo gelek kesan, werger çavkaniya dahateke zêdetir e. Ew jî dibe sedem ku hewldanek alîgiriya di berjewendiya dewletê de pêk bê, da ku ew derfet jî destê wan wergêran dernekeve.

Bersivdêr B: Wekî ku min li jor jî amaje pê kir, çavdêrî pir girîng e. Nexwe wekî din, wergêrên bêqalîte dikarin bi heman awayî xebata xwe bidomînin.

■ Gelo bi raya we di wan listeyan de wekhevî / hevsengiyek li ser bingeha zayendê dikare pêk bê?

Bersivdêr A: Ji ber ku piraniya wergêran karmendên dadgehê û nemaze rêveberên nivîsgeha dadgehê ne, mirov dikare bêje ku wekheviya zayendî ne pêkan e. Li Diyarbekirê jî bilî du sê parêzerên jin ku kurdî dizanin, peydakirina wergêrên jin hema bêje ne pêkan e. Ew rastiya ku piraniya karmendên dadgehê mîr in, nepêkanbariya wê hevsengiyê nîşan dide.

Bersivdêr B: Bêyî berçavgirtina vê mebesta taybetî jî, jî ber ku hejmara wergêrên jin pir zêde ye, hevsengiya zayendî pêkan e. Ji ber ku her kes jî danûstandina bi kesên din re xwe rehet hîs nake, ev pir girîng e. Ew xal nemaze jî bo qurbanîyan derbasdar e.

Encam û Pêşnîyaz

Anketa me ya derbarê Mafên Zimanî yên Kurdan di Dadgehan de, di salên 2022-2023'an de ji aliyê du parêzeran ve, li ser navê PENa Norwecê pêk hatiye û reşnivîsa wê di sala 2023'ê de hatiye weşandin. Ew anket bi 225 bertawanên ku ra hatibû çêkirin, ku zimanê wan ê yekem Kurdî bû û di navbera salên 2016-2022yê de, di dozeke da (Dadgeha Medenî yan jî Dadgeha Sizayî ya Bilid) hatibûne darizandin an zindanîkirin. Encamên anketê diyar dikin ku:

- a) Pêşdaraza aşkerê ya domdar hem li hember zimanê Kurdî bixwe û hem jî li hember wan bertawanan pêk tê ku dixwazin wî zimanî bikar bînin.
- b) Li gor nêrîna kesên lêkolînkirî, bijardeya wan a bikaranîna zimanê xwe yê yekem, bandoreke xirab li ser encamên doza wan kiriye.
- c) Sedî 99ê bertawanên ku beşdarî anketê bûne, ji aliyê wan polîsan ve ku îfadeyên wan yên destpêkê girtine (ku gelek ji wan îfadeyan derbasî angaştnameyê bûne), nehatine agadarkirin ku mafê wan heye di îfadeyên xwe de zimanê xwe yê yekem bikar bînin.
- d) Berî dayîna îfadeyan, tometên heyî ji sedî 62yê bertawanan re, ku bi wan re anket hatiye çêkirin, bi zimanê wan yê yekem an jî bi zimanekî ku herî baş jê fam dikin nehatine ravekirin.
- e) Tevî ku ji sedî 52yê bertawanên ku beşdarî anketê bûne, xwestine ku zimanê xwe yê yekem bikar bînin (di dema dayîna îfadeyê de an jî di dema darizandinê de) di nav wan de daxwaza sedî 63yê bertawanan hatiye redkirin.
- f) Sedî 78ê bertawanên ku beşdarî anketê bûne, di wê baweriyê de ne ku wergêran îfadeyên wan (şahidiya devkî) bi awayekî rast ji dadgehê re wernegerandine.
- g) Sedî 68ê bertawanên ku beşdarî anketê bûne diyar kirine ku dadger li ser daxwaza wan a bikaranîna Kurdî hin gotinan kirine. Dema mirov li wan bersivan dinere, hest bi biçûkxistinê dike yan jî di rewşa herî baş de Kurdî wekî 'zimanê nasnekirî' hatiye binavkirin.
- h) Belgeyên dadgehê ji sedî 99ê tawanbarên ku beşdarî anketê bûne re bi zimanê wan û zimanê ku herî baş dizanin nehatine ravekirin.
- i) Ji sedî 53 bertawanên ku beşdarî anketê bûne re şîret hatiye kirin ku ji bo bilezbûna prosedurên dadgêriyê dev ji wergêrê berdin.
- j) Sedî 47ê bertawanên ku beşdarî anketê bûne di wê baweriyê de ne ku kêmasiya di têgihiştin an hatin famkirinê de bandorî li ser encamên dadgehê dike.

Xalên li jor diyar dîkin ku xala 5ê ya DMMEyê ji aliyê piraniya dadgehên Tirkiyeyê ve nayê pejirandin. Anketa ku li çaraliyê welêt di nav girtiyan û bertawanan de hat kirin, îddîayên ciddî yên vegotinê yên têkildarî heqareta şexsî û çandî li bertawanan ji aliyê pergala dadgêriyê ve û binpêkirina aşkera ya mafên wan ên zimanî li xwe digire.

Ji hêla asta jêhatîbûn û pisporiya wergêrên dadgehê li Tirkiyeyê, encamên anketê ev in:

- a. Sedî 99ê bertawanan ku beşdarî anketê bûne, diyar kirin ku ew dixwazin li dadgehên Tirkiyeyê xizmetên wergêra Kurdî/Tirkî bi awayekî standardkirî, bi qalîte û profesyonel pêk bên.
- b. Sedî 79ê bertawanan ku beşdarî anketê bûne di wê baweriyê de ne ku dadgeh ji ber bikaranîna zimanê dayikê ji aliyê wan ve, an jî ji ber daxwaza wan a pêşkêşkirina parastina xwe bi zimanê dayikê li hember wan bi awayekî neyînî tevgeriyaye.
- c. Sedî 92yê bertawanan ku beşdarî anketê bûne alîgirê wê çendê bûn ku divê standard û pîvanên pêwîst ên ku wergêrên Kurdîyê li gor wan tevbigerin werin dariştin.

Em rêzîkên qanûnî yên heyî yên têkildarî sonda têrbariyê ya ku di Noterê de tê xwandin û piştra jî zêdebûna di lîsteyên herêmî de gelek bi kêmasî dibînin. Nemaze wê dawiyê (sal bo salê bi kêmasîtir) û ji 2016/18ê ku li Tirkiyeyê serweriya qanûnê rastî kirîzeke mezin hatiye.

Desteserkirin, girtina pêşdadgehî, zindanîkirina karmendên medyaya Kurdî û rojnamevanên Kurd di sala 2024ê de berdewam dike. Herwiha dadgehkirina berdewam ya 18 rojnamevanan li Diyarbekirê û desteserkirinên demdirêj di heyama salê de bi taybetî desteserkirina 121 kesan di 21ê Çiriya Paşîn de, ku di nav wan de 8 rojnamevan jî hebûn hîn dom dike.

Li gor nêrîna me, xala 202yê ya Qanûna Rêkarên Darizandina Sizayî ya Tirkiyeyê, têra xwe piştgiirî nade mafên zimanî yên gumanbaran an jî mafê darizandina dadmend. Lewra jî li gor vê xalê, tê texmînkirin ku wergera 'xalên sereke ên angaştê ji bo agahdarkirina gumanbarî ji îdia û hûnguliyên dozê têrê dike.

Tu tevdîrek ji bo kesên ku dixwazin ne tenê xalên sereke, lê belê hemû angaştname were wergerandin nehatiye berçavgirtin. Herwiha xala 202 (2) yê li dijî berjewendiya gumanbar/ bertawanan e. Lewra jî dibêje bertawan berpîrsê hebûna wergêrê ye û nikare sûdwerigirtin ji mafê gihiştina wergêrê di dema parastina xwe de wekî amûrekî ji bo dirêjkirina pêvajoya darizandinê bi kar bîne. Mafê gihiştina wergêrê û têgihiştina bê kêmasî ya pêvajoya dadgêriyê, bi zimanekî ku mirov herî baş jê fêhm dike, mafek mirovî ye ku di xala 5an a Peymannameya Ewropî ya Mafên Mirovan de cih girtiye û ji ber vê yekê jî ne serpişkî, lêbelê mafek qanûnî ye.

“(Xala 202) (b) û li ser ramana gewherî ya dozê, bertawan dikare parastina xwe ya devkî bi zimanekî bike ku li gor wê/wî, ew kes dikare xwe herî bi bandor bi wî zimanî îfade bike. Di vê rewşê de, karûbarên wergerê dê ji hêla wergêrê ve pêk bên, ku tawanbarî ji lîsteya ku li gor Paragrafa 5-ê hatî amadekirin, hilbijartiyê. Heqdestê wî wergêrê ji hêla Xezîneya Dewletê ve nayê dayîn. Nabe ku ev serpişkî bi mebesta sekinandina darizandinê bê bikaranîn

Pêşniyaz:

1. PENa Norvecê pêşniyaz dike ku rayedar li Tirkîyeyê organeke serbixwe ji bo perwerde, nîrxandin (salê du caran) û parastina qeydên wergêrên şêyandar yê wergera hiqûqî ya Kurdî-Tirkî ava bikin. Pêwîst e di wê qeydkirinê da ji bo dabînkirina hevsengiya zayendî hewildanên ciddî bîn kirin.

2. Herwiha em pêşniyaz dikin ku kursên mîna kursa ku di 14ê Çiriya Pêşî ya 2024ê de ji aliyê TOHAV'ê (Weqfa Lêkolînên Civak û Hiqûqê) û PENa Norvecê ve li Stanbolê hate destpêkirin, bîne lidarxistin. Di wê kursê de 15 wergêran beşdarî kir û di heyama 12 civînên perwerdehiyê de, bi giştî li ser hiqûqê, wergera nivîskî ya Kurdî-Tirkî û Tirkî-Kurdî û wergera peyhev û hevdem xebitîn û herwiha derseke destpêkî li ser etîk û bêalîbûnê têkildarî wergera li dadgehan dîtîn. Divê ew kurs ne tenê ji bo zimanên Kurdî û Tirkî, lê belê ji bo hemû wan zimanan bîne lidarxistin, da ku encamên wan li seranserê welat, li dadgehan bîne bikaranîn.

3. Herwiha em pêşniyaz dikin ku komîteyek ji pisporan bê avakirin da ku pêwîstiya saziyek serbixwe ji bo destpêkirin û çavdêriya ezmûnên şêyandariya wergerandin û wergera li dadgehan binirxîne.

4. Tê pêşniyazkirin ku Enistîtûya Zimannasan ya Qiraltiyên Yekbûyî ku Dîplomoya Wergeriya Xizmetên Giştîl dide, wekî nimûneyekê bê berçavgirtin. Tê Pêşniyazkirin ku bi rêya saziyeke serbixwe ya li Tirkîyeyê şêwirîn bîn kirin û girîngî bi avakirina sistemeke wiha bê dayîn û di vî warî de veberhênan bîn kirin.

5. Di rewşekî da di sistema dadgêriya Tirkîyeyê de têkildarî zimanê Kurdî cudakarî pêk tê, em pêşniyaz dikin ku ji bo parastina zêdetir û dabînkirina mafên kesên ku bi vî zimanî li dadgehan û di hemû astan de diaxivin, gav bîn avêtin. Ew gav dikare çêkirina katagoriyekê be ji bo îmzakerên Peymana Zimanên Herêmî yan Kêmîneyan û ew katagorî dikare li dewsa endamên Yekîtiya Ewropayê, ji aliyê endamên Konseya Ewropayê ve bê îmzakirin. Hewriha gaveke din dikare zêdekirina bendên xurttir be li qanûnên heyî, da ku pirsgerêka nebûna qanûnên têkildarî wergerê li dadgehan li Tirkîyeyê bê çareserkin.

6. Em pêşniyaz dikin ku rayedar li Tirkîyeyê li gel ofîsên peywendîdar yê Rêveberiya Giştî ya Cîrantî û Danûstandinên Berfirehkirinê ya Konseya Ewropayê bikevine têkiliyê, da ku di derbarê budce û perwerdeyeke wiha giring û dabînkirina mafên zimanî li pergala dadgêriyê ya Tirkîyeyê nîqaşan bikin.

Pirs:	Erê:	Na:	Bê bersiv:	Erê %	Na %	Bê bersiv %
Gelo di heyama pênc salên borî de te wekî gumanbar an tawanbar di nav dozekî de cih girtiye?	Erê: 215	Na: 10	Bê bersiv: 0	95.56%	4.44%	0.00%
Gelo beriya ku tu îfadeyên xwe bidî, tometên li dijî te û mafên te bi zimanekî ku tu jê fam dikî ji te re hatin ravekirin?	Erê: 79	Na: 139	Bê bersiv: 7	35.11%	61.78%	3.11%
Dema ku polisî/ dozgerî îfadeyên te girtin û herwiha di heyama lêpîrsînê dadgeha hiqûqî/medenî de, gelo ji te re hat gorin ku mafê te heye zimanê xwe bi kar bîni?	Erê: 2	Na: 217	Bê bersiv: 6	0.89%	96.44%	2.67%
Gelo te di maweya wergirtina îfadeya xwe de an/û di dema lêpîrsînê dadgehê de xwesteka xwe ya bikaranîna zimanê dayikê anî ziman?	Erê: 118	Na: 93	Bê bersiv: 14	52.44%	41.33%	6.22%
Gelo xwesteka jorîn hate pejirandin?	Erê: 44	Na: 110	Bê bersiv: 71	19.56%	48.89%	31.56%
Gelo peydakirina wergêrî wextê dayîna îfadeya te dirêjtir kir?	Erê: 44	Na: 42	Bê bersiv: 139	19.56%	18.67%	61.78%
Gelo bi raya te wergêrî tometên li ser te, pîrsên ku hatine kirin û îfadeyên te bi awayekî tekûz ji bo te vergerandin?	Erê: 19	Na: 67	Bê bersiv: 139	8.44%	29.78%	61.78%
Dema ku te di pêvajoya lêpîrsînê de daxwaza bikaranîna zimanê dayikê kir, polis, dozger an jî dadgerî tiştek gorin an bertekek nîşan dan?	Erê: 86	Na: 41	Bê bersiv: 98	38.22%	18.22%	43.56%
Gelo tu ji aliyê dadgehê ve hatiye sizadan?	Erê: 130	Na: 75	Bê bersiv: 20	57.78%	33.33%	8.89%
Heger ku tu di pêvajoya lêpîrsînê de hatî sizadan, gelo bi raya te daxwaza parastinê û/ an xweparastina bi zimanê dayikê bandorek li doza te kiriye?	Erê: 77	Na: 45	Bê bersiv: 103	34.22%	20.00%	45.78%
Gelo belgeyên di dosyaya te de bi zimanê dayikê ji te re hatin şandin?	Erê: 2	Na: 207	Bê bersiv: 16	0.89%	92.00%	7.11%
Gelo te angaştnameya ku der barê te de hatibû amadekirin an jî tawanên di angaştnameyê de fêm kir?	Erê: 115	Na: 13	Bi qismî: 80 Bê bersiv: 17	51.11%	5.78%	7.56%
Gelo beriya darizandinan ji te hat pîrsin ku tu qebûl dikî heqdestê wergêrî bixwe bidî an na?	Erê: 35	Na: 153	Bê bersiv: 37	15.56%	68.00%	16.44%
Gelo te dizanî ku te di dadgehê de mafê bikaranîna zimanê dayikê heye?	Erê: 169	Na: 38	Bê bersiv: 18	75.11%	16.89%	8.00%
Gelo te di heyama rûniştinan de daxwaza bikaranîna zimanê dayikê kir? (an bixwe an jî bi rêya nûnerê xwe yê qanûnî)	Erê: 132	Na: 73	Bê bersiv: 20	58.67%	32.44%	8.89%
Gelo di dadgehê de, te çi şîrove an bersivên dadger û/ an jî dozger ne di cih de an jî wekî heqaret dît?	Erê: 85	Na: 74	Bê bersiv: 66	37.78%	32.89%	29.33%
Gelo ji te re hat pêşniyazkirin ku ji bo bilezbûna peyketinê dest ji wergêrî berdî?	Erê: 60	Na: 85	Bê bersiv: 80	26.67%	37.78%	35.56%
Gelo dadgehê rê da we ku hûn zimanê xwe yê dayikê bikar bînin?	Erê: 73	Na: 120	Bê bersiv: 32	32.44%	53.33%	14.22%
Gelo bi raya te kêmasiyên di têgihiştinê de an hatin-famkirinê de bandor li encamên darizandinê kirine?	Erê: 107	Na: 70	Bê bersiv: 48	47.56%	31.11%	21.33%
Gelo tu difikirî ku dadgeh ji ber bikaranîna zimanê dayikê yan jî daxwaza te ya parastina bi zimanê dayikê, li hember te bi awayekî neyînî tevgeriyaye?	Erê: 132	Na: 35	Bê bersiv: 58	58.67%	15.56%	25.78%
Gelo tu dixwazî li dadgehên Tirkîyê xizmetên wergêra kurdî/tirkî ya standardkirî, bi qalîte, profesyonel bibîni?	Erê: 207	Na: 3	Bê bersiv: 15	92.00%	1.33%	6.67%
Gelo bi raya te baş dibe heger ku standard û pîvanên pêwîst ên ku wergêrên kurdî li gor wan tevbigerin werin dariştin?	Erê: 180	Na: 24	Bê bersiv: 21	80.00%	10.67%	9.33%

* Bersivên vegotinî yên vekirî ji vê tabloyê hatine derxistin.

pen
INTERNATIONAL

Girona Manifesto on Linguistic Rights

**Promoting Literature,
Defending Freedom of Expression**


PENa NEVNETEWÊÎ
Manifestoya Gironayê ya Derbarê Mafên Zimanî de
Pêxistina Lîteraturê, Parastina Azadiya Derbirînê

PEN International brings together the writers of the world. Developed in Girona (May 2011) by the PEN International Translation and Linguistic Rights Committee, ratified by the PEN International Assembly of Delegates at the 77th Congress (September 2011), this Manifesto declares PEN International's ten central and guiding principles on linguistic rights.

Pena Nevneteweyî nivîskarên cîhanê li hev kom dike. Ev manifestoyê jî aliyê Komîteya Werger û Mafên Zimanî ya PENa Navneteweyî ve (di mehê Gulana 2011ê de) li Gironayê hatiye dariştin û di Kongreya 77ê de, ji aliyê Meclîsa Nûneran a PENa Navneteweyî ve hatiye pesendkirin (di îlona 2011ê da). Ev manifestoyê de binemayên sereke û rênîma yê PENa Navneteweyî yê têkildarî mafên zimanî radigihîne.

1. pirrengiya zimanî mîrateyeke cîhanî ye ku divê nîrxê wê bê zanîn û bê parastin.
2. Ji bo pêvajoya avakirin û domandina diyalog û aştiyê, rêzgirtin ji hemû ziman û çandan li cîhanê bingeh e.
3. Hemû kes di dilê civakekê da hînî axaftinê dibin ku jiyan, ziman, çand û nasnameyê dide wan.
4. Zimanên cuda û awayên cuda yên axaftinê ne tenê navgînên ragihandinê ne, lê belê di heman demê de ew hawirdor in ku tê de mirov mezin dibin û çand ava dibin.
5. Her civakeke zimanî mafê vê çendê heye ku zimanê wê di nav sînorên terîtoriya wê de wekî zimanekî fermî bê bikaranîn.
6. Divê perwerdeya li dibistanan, alîkariya prestîja wî zimanî bike ku ji aliyê civaka zimanî ya herêmê ve tê axaftin.
7. Hebûna zanista giştî di derbarê zimanên cihêreng de, ji bo şarmendan tiştekî baş e, lerwa jî alîkariya empatiyê û vekirîbûna rewşenbîriyê dike, û dibe alîkar ku zanista mirovan di derbarê zimanê wan de kurtir bibe.
8. Wergerandina metnan, nemaze metnên berhemên mezin ên çandên cuda, nîşanderê hêmaneke pir girîng e ji bo pêvajoya pêwîst a hevtêgihîştinê û rêzgirtina zêdetir ya mirovan ji hevdu.
9. Medya ji bo çêkirina pirrengiya zimanî û bilindkirina prestîja wê bi awayekî jêhatî û xurt, bilindgoyeke xwedî serpişkî ye.
10. Divê mafê bikaranîna zimanê dayikê û parastina wî zimanî, ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve wekî yek ji mafên bingehîn ên mirovan bê naskirin.

pen
INTERNATIONAL



PENa Navneteweyî edebiyat û azadiya derbirînê bi pêş dixê. Çarteya PENê û binemayên ku têda cih digirin -veguhastina bê astengî ya ramanan di nav her gelekî da û di navbera hemû gelan da- li ser karûbarên wê saziyê hakim e. Ew sazî di sala 1921ê da li bajarê Londonê hatiye damezrandin û civaka navneteweyî ya nivîskaran ji hev girê dide. Ew forumek e ku nivîskar bi serbestî tê da dicivin, da ku li ser xebatên xwe nîqaşan bikin. PEN di heman demê de dengê wan nivîskaran e ku li welatên xwe hatine bêdengkirin. PEN bi navendên xwe li her pênc parzemînan û bi 146 navendan, li 102 welatan dixebite.

Ji bo agahiyên zêdetir di derbarê Manifestoya Gironayê ya Derbarê Mafên Zimanî de, binêre: www.pen-international.org/who-we-are/translation-linguistic-rights/girona-manifesto/girona-manifesto-on-linguistic-rights/

PENa Navneteweyî dezgeheke xêrxwazî ye ku li Înglîz û Welzê bi hejmara 1117088ê hatiye qeydkirin.

Brownlow House, 50-51 High Holborn, London, WC1V 6ER. United Kingdom. Tel: +44 (0)20 7405 0338 www.pen-international.org

**P E N
N O R W A Y
2025**